

## Rojava, Derfet, berpirsyarî û berjewendî

Gellek kes dibêjin ku derfeta bo kurdan li Rojavayê Kurdistanê hatî pêsh, fersendeke sedsalî e û weha derfetek sed salan carek bo neteweyekê dikare bê pêsh û eger partî, rêkxistin û komên kurdistanî wê fersendê bash bi kar neynin, dibe carek din Kurd li Rojava 100 salan chavnihêr be heta carek din mecalek hanekî bash jêre chêbe.

Dom»R:5





*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (486) 19-01-2025 Buha (1000) Tûmen*




## Rojhelata Kurdistan li derwazeya Guhertinê de

Rojhelata Kurdistanê di qonaxeke krîtîk deye. Hilweşîna rejîma Esed li Sûriyê, ku bingehek ji bandora herêmî ya Îranê ye, dîmena jeopolîtîk bi awayekî bingehîn guhertiye. Di heman demê de, zextên navxweyî – aborî, civakî û ekolojîk – deselata komara Islamiye Îranê lawaz dike, hem derfet û hem jî metirsiyên nedîtî ji bo gelê Kurd çêdike.

Dom» R:4



## Tirs û derevên rayedarên Komara Îslamiya Îranê

Di heyama salên dervasbûyî de berpirsên payebilind yên Îran û Spaha Pasdaran bi berdewamî li ser ekranên televîzyonan derdiketin gefên jinavbirina Îsraîlê dixwarin û bi berdewamî çiya û bajarên Herêma Kurdistanê bi dron û mûşekên dûrhavêj bi hinceta hebûna partiyên kurd yên dijî rêjîma Îranê dikirin armanc û bi berdewamî di karûbarên birêveberiya Îraqê de tedaxol dikirin.

Dom» R:10

# Bi hilkefta 2 yê rêbendanê, 79emîn salvegera avakirina Komara Kurdistanê

**Peyama Navenda birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Hogirên armancên Komara Kurdistanê!**


2 yê rêbendana 1324 a Rojî, anku 79 salan berî niha gelê Kurd li Rojhilatê Kurdisdtanê, yek ji rûpelên zêrîn a dîroka xwe tomar kir û bi kiryar kiyaneke siyasî-netewî li ser beşek ji cografiyaya Rojhilatê Kuyrdistanê ava kir.

Bi hilkefta vê salvegera mezin, em pîrozbahiyên herî germe xwe pêşkêşî we dikin û we mîratgirpên Komara Kurdistanê erxahîn dikin ku heta bi destveanîna armancên vê Komarê, domderê rê û rêbaza avakerê Komarê bin.

Ragihandina Komara Kurdistanê li bajarpê Mihabadê ji aliyê rêberê lêzan û Pêşewayê Hizba Dêmokrat a Kurdistanê, Qazî Mihemed ve ji çendîn aliyan ve hêjayê bi bîranîn û şirovekirinê ye.

Jidayîkbûna desthilta Kurdî û li hemen demê de naveroka vê, hejmarek peyam û encam bo gelê Kurd li xwe girtine ku ne tenê li vê dema kin de nemaye, belku bandora vê bo niha û paşeroja xebata rizgarîxwaziya netewa me maye û dê her bimîne.

Hekî Komara Kurdistanê tenê li cografiyeke sînodar de maye û bo heyamê 11 heyvan berdewam bû, lê ji warê ew karlêkeriyên ku li





ser xebata netewiya geelê me bi cî hişt, hem cografiyaya Kurdistanê bi hgemî beşên din ve girêda û hem niha jî wek dînamîzmeke tevgera neteweyî bo ser hemû tevgerên netewî de rol heye.

Dom» R:2



## Guherînên li rojhelata navîn û derfeta ji bo kurdan

Dom » R:3




## Rojavayê Kurdistanê û astengiyên niha

Dom » R:9

# Peyama Navenda birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê

**Doma R:1**

Komara Kurdistanê bi cihgîrkirina îradeya xwebirêveberiya gelê Kurd, geşedan bi ziman, çand, xwendîn, huner û herwisa dabînkiirina aramî û asayîêsê bi rêya avakirina Sipaha Nîştimanî û piştre navdêrkirina cengawerên Kurd bi "Pêşmerge" û hildana Ala ya Kurdistanê û bi fermîkirina sirûda netewî û avakirina çapxane û wêzgeha radio û belavkirina çendîn govar û rojname û herwisa serwerkirina yasyê bi ser hemû welatiyên Komra Kurdistanê de û ji hemiyan girûngtir, komkirina kesayetiyên olî, rewşenbîûrî û serokên eşîretan li bş û deverên cuda yên Kurdistanê li çarçoveya Hikûmeta Kurdî de, binyata netewesaziyê bi şêwazek cihgîr kir ku bi derbasbûna nêzî 8 dehikan ji hilveşîna vê komarê, heta niha jî gelê me li hemû beşên din ên Kurdistanê bi şanazîkirinê vê bi bîr tînin.

Avakirina Komara Kurdistanê pêkhatî ji binyeteke dîrokî ji hişariya netewî û reh û koka vê çavkaniya xwe ji tevgera rizgarîxwaziya gelê kurd girtibû ku herî kêm li dîroka serdem de bi berdewamî zindî û berqirar bûye. Piştî ku Riza şahê Pehlewî, hewl da dewlet-neteweya Îranî bi mehandina netewên ne-fars ava bike, gelê Kurd bi hemû şêwazekê li hember vê projeyê sekinî û amade nebû vê sitema mezin qebûl bike.Li rastiyê de avakirina Komara Kurdistanê, redkirina dewlet-neteweya seqet a îranî bû ku hewl dida bi derba hêzê, xwe bisepîne.

Ew helwêsta dîrokî ji aliyekê bo yekem car kire xwdiyê kiyaneke serdemiyane û pêşkvtinxwaz a netewî û ji aliyê din ve nirxeke giranbiha xiste ser dîroka gelê me.Yek ji taybetmendiyên komara Kurdistanê, bawerî bi tolêrans û pêkvejiyana aşêtiyane bû ku tê de hemû cudatiyên civaka Kurdistanê bi Kurd û Azerî û Ermenî û yên din cih bibûn.

Li serdemekê de ku piraniya welatên deverê xwdiyê sîstemek siyasî ya ne-demokratîk û xoser bûn, serî hildana desthilatek demokratîk li beşek ji Kurdistanê, hişyarî û aqilmendiya rêkxistina Hizba Dêmiokrat a Kurdistanê û rêberên vê, da xuya.

**Xelkê têkoşerê Kurdistanê!**

Îsal li demekê de em bo pêşewaziya 2 yê Rêbendanê ve diçin ku komara Îslam û civaka Îranê bi giştî û rojhilatê Kurdistanê bi taybetî di rewşeke hestiyar re derbas dibin. Rêjîma siyasî li Îranê de çi li navxwe û çi li asta derve, rastî komek ji qeyranên kûr hatiye, li asta navxweyî de roj bi roj derz û cudatiya li navbera xelk û desthilatê zêdetir dibe û nerizayetiya qatên û texên cuda li derheq rewşa xirab û qeyrana aborî, rewşeke tepeserker û fetisîner a siyasî, zêdebûna rêjeya bidarvekirinan û sepandina sizayên giran bi ser çalakvanên siyasî û medenî, pirsgirêkên civak yên pengurî, gendeliya sîstematîk û berfireh li hemû navendên bingehîn, bêhivîtî û koçberbûna bi kom a ciwanan û hêza pispor a mirovî bo dereveyî Îranê û li encamê de derbasbûna gelên Îranê li warê hizrî ji rêjîma xwesepandî bi ser Îranê de zêdetir dibe, bi awayekê ku heta beşeke zêde ji teorîsiyen û şarezayên li hundirê desthiltê, îtiraf bi amadebûna seha şoreşgerî li nav komên xelkê Îranê bi armanca dawîanîn bi vê desthilatê dikin.

Li asta Rojhilatê Kurdistanê de hem qeyran berfirehtir in û hem amadeyî bo berfirehtirkirina rêkxistinkirina nerizayetiyan heye, ew yek jî bûye sedem ku xelkê Kurdistanê ji hemû derfetan bo nîşandana bêzarî û redkirina siyasetên rêjîmê bi kar bînin û wek pêşengê tevgera azadîxwazî li Îranê bêne meydanê. Tevgera Jînayê bi beşdariya berçav a xelkê Kurdistanê li xwenîşandanên nerizayetiyan de bi berhevdanîn digel deverên din li Îranê, kesayetiyeke siyasiya wiha bi Kurdistanê bexşiye ku çi li asta navxweyê Îranê û çi li asta navnetewî de pirsa Kurd berçavtir kiriye û Rojhilatê Kurdistanê wek derwazeyê guherînan hatine nîşandan.

Xelkê Kurdistanê ku her ji destpêka hatineserkar a vê rêjîmê ve xebateke nasnamexwazî ya çendîn alî li dijî desthilatê destpêkirine, piştqahîm bi Hizbên siyasî yên netewî û şoreşgêrên vê ku xwediyê pêgehek berfireh li civakê de hene û bi taybet li tevgera




Jînayê û çendîn bûyerên din de li wan salan, ev rastiya da selimandin, bûne cihê hivî û hêviya gelên bêzarbûyî yên Îranê.

Li asta navnetewî de, komara Îslamî li pêywendiyên siyasî, aborî û ewlehî de li paşekêşiyeke berdewam de ye û li civaka cîhanî de bi tevavî bi tenê maye û bi tenê rêjîmên dîktator û neberpirs bi şêwazeke sînordar û pêka berjewendiyên xwe reftarê digel de dikin. Dirûşmên birqoq yên rêjîmê li derheq rizgariya gelê Felestînê û hinardeya înqilab ku 45 sal e wek stratejiya parastina xwe, penah bo biriye, rastî şikesteke bêveger hatiye. Bi şêwazekê ku pitira milîsên ser bi vê rêjîmê li Felestîn, Lubnan, Sûriye, Yemen û cihên din ku li ser hisaba serweta gelên Îranê hatiye avakirin û bi çekan ev teyar kirine, li ser lêva kendalê nemanê de ne.

Herifîna rêjîma Esed li Sûriyê ku wek xelwetgeha ewleh a rêjîmê bo geşedan bi terorîzmê mifah jê werdigirt û bi dehan milyard Dolar lê xerc kiriye, derbeke giran li ewlehiya rêjîmê daye ku ew şikest heta hawara hinek kesên li navxweyê rêjîmê li pey xwe aniye. Pêvajoya bûyeran wa dide xuya ku komara îslamî bê neçarkirin ku bi tevavî bigere nav qalibê xwe û êdî nikare leyîzê bi qedera gelê Felestîn û gelên din ên deverê li pêxema mana xwe de bike.

Bi berçavgirtina tev qeyranên navxweyî û derve û bi balkêşandin bi şikesta îdeolojîkî ya rêjîmê ji aliyek û pengurîna kerb û bêzariya gelên Îranê ji aliyê din ve, bo me îsbat dibe ku berdewamiya desthilata komara Îslamî roj bi roj rastî astengiyên mezintir dibe û nirxa mana vê jêre gelek girantir dibe.

**Hizb û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê!**

Bi balkêşandin bi rewşa ku li îranê de hatiye pêş, derfetek baş bo tevgera rizgarîxwaziya Kurd peyda bûye û Hizb û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê kevtine ber berpirsayetiyeke dîrokî û bi tenê bi yekîtî û yêkrêziyê dikarin bersivderê vê qonaxê bin û gelê Kurd li Kurdistanê bi bidestveanîna mafên netewiye wan hivîdar bikin. Pêkanîna platformeke hevpar li demek wiha de erkê dîrokiye Hizbên siyasiye Rojhilatpê Kurdistanê ye û Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li vê pêxemê de hemû pêngawek hewce bo bidestveanîna rewşeke bi wec bo karê hevpar dihavêje û daxwazê ji tev Hizb û aliyan dike ku bi baldan bi hewcehiya hestiyar a rêkxistina nav mala Kurd li rewşa niha de hewlên xwe bidin.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tevî bilindragirtina yadê Komara Kurdistanê û pirozbahîkirina vê bîranîna mezin li gelê Kurd, armanc û destkevtên Komarê bi çiraya rêya xebat û têkoşîna xwe dizane.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Navenda Birêveberiya Giştî**

**19 yê Kanûna Duyem 2025 a Zayînî**

# Guherînên li rojhelata navîn û derfeta ji bo kurdan



N. Mihemedsalih Qadirî



Paş bûyera 7ê oktoberê û karvedanên Îsraîlê li dijî eniya girêdayî Îranê (Hemas, Hizbullah, Beşar Esed û Husiyan) êdî hevsengiya hevkêşeyên siyasî, ewlehî, aborî û civakî ên cîhanê, bi xasmanî li Rojhelata Navîn ber bi guherîn û dîzaynkirineke nû ve diçe.

Di vê dîzaynkirina nû de xuya dibe ku welatên Ewropî, û Amerîka û Îsraîl ji bo berjewendiyên xwe yên ewlehî û aborî, êdî rê nadin hikûmet û grûpên tundrev yên îslamaî bibin metirsî li ser berjewendiyên wan.

Bona ku vê projeya nû bigihînin armancê, bi berçavgirtina pêşîne û rolê cuda cuda yê welatên mîna Îran, Îraq, Sûriye û Turkiyê di sponseriya grûpên olî yên tundrev di Rojhelata Navîn de, xuya dibe ku êdî ne Îsraîl û ne jî Amerîka û Ewropa rê nadin ew welatane bikarin wekî berê bimînin, û bibin metirsî li ser ewlehî û berjewendiya wan.

Girêdayî wê rewşê em dibînin rejîma Îranê û Hûsiyan çawa ewlehiya veguhastina petrol û ticareta cîhanê li kendawê û behra sor de xistine bin astengî û metirsiyê de.

Ji aliyekî din ve jî piştî şerê Rûsiyê û Okraynê, ew dorpêçên ku ji aliyê Ewropa û Amerîka ve ketin ser Rûsiyê, bûne sebebê astengiyan ji bo veguhastina enerjî û şewata Rûsiyê ji bo Ewropayê, û qeyranên mezin çêkirine.

Ew bûyer û rewşa han bûne sedemê vê yekê ku Ewropa û Amerîka û Îsraîl pilan û projeyeke stratejî ji bo dîzaynkirina Rojhelata Navîn dabirêjin, û ji aliyekî ve hewl bidin bi rêya şer, serkirde û îmkanatên locîstîkî yên leşkerî û hejmûniya Îranê û hikûmet û grûpên dûvelankê wê Li Xeze, Lubnan, Sûriye, Yemen û Îraqê ji nav bibin, ji aliyek din ve hewcehî bi bedîl û korîdorên nû bo berjewendiyên pêşeroja xwe çêkin.

Di pirojeya han de guherînên jeopolîtîkî di Rojhelata Navîn de ihtîmalek bihêz in û di wê dîzayna nû de sîstemên dîktator û alîgirê fikrê tundrev ên îslamî nayên qebûlkirin, û di hember de wê sîstema ferderalî û bihêzkirina pêgeha pêkhateyan were esasgirtin.

**Di bin bandora wê rastiya han de em dibînin paş hilweşîna hikûmeta Beşar Esed li Sûriyê, welatên Ewrûpayî û Amerîka bi rayedarên nû yên li Şamê re di nav diyalog û tevgerê de ne, da ku sîstemek demokratîk bi beşdariya hemû pêkhateyan were damezrandin, lewma qet rê nadin di Sûriyeya cînarê Îsraîlê de hikûmetek îslamî û dîktator were ser hukim.**

Bi heman awayî zext li hikûmeta Îraqê jî kirine ku ew grûpên milîşiya yên girêday Îranê yan dibe werin hilweşandin, yan jî wê bi derbeyên leşkerî ji holê werin rakirin.

Ji aliyekî din ve bihêzkirina pêgeha Hikûmeta Herêma kurdistanê di ragirtina balans û hevsengiya dewleta Îraqê de xwedî girîngiyek taybetî ye bo Amerîka û Ewropayê.

Herwisa erebên Sunne jî daxwaza awakirina herêmeke federal bo xwe dikin.

Di bin bandora vê rewşa nû de, em dibînin rayedarên Turkiyê jî, ji bo xwe derbaskirin ji hinek qeyranên siyasî, aborî û ewlehiya navxweyî û herêmî, neçar in gavên ber bi çareseriya pirsa Kurd û guherîna destûra bingehîn û demokratîzekirina wî welatî bigirin pêşiya xwe, û bi birêz Ebdullah Ocelan û Dem Partiyê re pêvajoyek nû dest pê bikin.

Qonaxa herî girîng ya guherîna Rojhelata Navîn dê bi hilweşîna rejîma Îranê bigihîje dawiyê.

Di 46 salên derbasbûyî de sîstema hukimdariya îdeolojîk ya melayên Îranê ku li ser bingeha hinardekirina şoreşa îslamî ya şî`etiyê bi navê "Bereya Miqawimet" dihate naskirin, bibû sponserê hemû grûpên tundrev û terorîst yên îslamî di Rojhelata Navîn û cîhanê de.

Piştî hêrişa Hemasê bo ser Îsraîlê, û piştgiriya rejîma Îranê û grûpên girêday bi wê (Hizbullah, Hûsî, Heşdî Şebî û ...hwd) ji Hemasê, me dît çawa ew eniya han ji aliyê Îsraîlê ve bûye armanca jinavbirinê, û heta niha çiqas derbeyên mezin li wê eniyê ketine, û per û bask û dest û piyên wê yek li pey yekê têne şikandin, lê wekî eyan e serê mar hêj li Tehranê dicivcive, û divê operasiyona herî dawî bona tunekirina wê rejîma terorîst û fitneya dunyayê were lidarxistin.

Guman tê de nîne ku hilweşîna rejîma Îranê, û dawî hatina felsefeya hinardekirina şoreşa îslamî ya melayên Îranê û hilweşîna wan grûpên dûvelank ku qedera xwe bi wê rejîmê ve girê dane, wê roleke dînamîkî û bingehîn di guherînên li Rojhelata Navîn û aştî û tenahiyê de hebin.

Ew guherînên Rojhelata Navîn dê derfeteke zêrîn bo gelê Kurd jî pêk bînin.

Ger kurd bizanebûn û bi yekgirtî bi aliyên eleqedar re bikevin têkelî û tevgerê, bi berçavgirtina wê hevpeymaniya kurdan a di şerê li dijî terorîzma DAÎŞê de bi hêzên hevpeymanan re hebûne, û li gor girîngiya pêgeha jeopolîtîkî ya Kurdistanê di hevkêşeyên herêmî û bi xasmanî di ewlehiya rêreva aborî ya Rojhelata Navîn de, û bi hebûna kultura tolerans û pêkvejiyana aştiyane bi pêkhateyên herêmê re, dê karibin piştgiriya cîhana modern bo xwedî derketin ji statoyekê di her yek ji welatên Îraq, Îran, Turkiye û Sûriyê bi dest bixin, û bibin fakterek bihêz ji bo aştî û aramiya li Rojhelata Navîn.

# Rojhelata Kurdistan li derwazeya Guhertinê de



N. Dr. Mecîd Heqî

Rojhelata Kurdistanê di qonaxeke krîtîk deye. Hilweşîna rejîma Esed li Sûriyê, ku bingehek ji bandora herêmî ya Îranê ye, dîmena jeopolîtîk bi awayekî bingehîn guhertiye. Di heman demê de, zextên navxweyî – aborî, civakî û ekolojîk – deselata komara Islamiye Îranê lawaz dike, hem derfet û hem jî metirsiyên nedîtî ji bo gelê Kurd çêdike.

Hilweşîna Eniya Berxwedanê (cebheyê muqavimet), ku hevalbendiyeke bêbandor a Îran, Sûriye û Hizbullahê ye, serweriya herêmî ya Îranê lawaz kiriye.Ev veguhertin bi potansiyel dikare ji bo xebata netewa Kurd li rojhelata Kurdistanê de derfetên nû biafirîne. Lêbelê, ew metirsiya bêîstiqrariya herêmî û potansiyela zêdekirina zordariya Îranê ji bo domandina kontrolê jî zêde dike.

Rojhelata Kurdistanê di dema 45 salên derbaz bûy de berxwedanek mezin û bi rûmet pêşve biriye. Xasmayî li şoreşa Jîna (Jin, Jiyan, Azadî) de, asta bilinde çanda medenî û têgehiştina netewiye gelê Kurd ji bo hemû cîhanê derket holê.

Pêla berxwedanên heyî yên naw beşên dine Iranê, li dijî hikûmetê, ku ji ber dijwariya aborî û nerazîbûna civakî bi gurr dibe, dikare vebûnek ji daxwazên Kurdan re peyda bike. Lê belê, pirsgirêkên nawxweyiye hêzên siyasiye Kurdistanê dikaribe bibe tehdîdek mezin dijî derfetên potansiyel û gelê Kurd bi wê hegerê dikare bibe qurbaniyê bûyeran.

Tevgera Kurd li Rojhelata Kurdistanê bi kêşeyên navxweyî yên girîng re rû bi rû ye. Nakokiyên kûr di navbera partiyên siyasî yên Kurd de hene, ku rê li ber karîna wan a pêşkêşkirina eniyeke yekgirtî digire.
Ev nebûna yekîtiyê hêza wan a muzakereyê qels dike û metirsiya şerê navxweyî zêde dike, dibe ku enerjiyê ji lêgerîna xweseriyê dûr bixe.

Rewşa aborî ya Îranê, bi zêdebûna enflasyon û bêkarîya berbelav, xirab e. Ev yek bandorek rasterast li ser nifûsa kurd dike, ku gelek ji wan xwe dispêrin çandinî û karsaziyên piçûk, Xerabûna jîngehê, bi taybetî jî kêmbûna avê, krîza aborî hîn girantir dike û debara gelek Kurdan dixe xeterê.

### Lêgerên ber bizava netewî li Rojhelata Kurdistanê

Guhartinên Rojhelata Nawîn û rewşa cîhanê derfetên zêrîn ji bo pêşeroja bizava Kuristanê xulqandine. Lêbelê, riya gelê me bi dijwariyan re tije ye:
• Pevçûnên navxweyî: Tevgerên siyasî Rojhelata Kurdistanê bi perçebûyî dimînin û şiyana wan a pêşkêşkirina eniyeke yekgirtî lawaz dike.
• Zordestiya dewletê: Rejîma Îranê bi girtin, bidarvekirin û çewisandinên leşkerî li ser tepeserkirina çalakvanên Kurd didomîne.
• Hevrikiyên Herêmî: Hevrikiya di navbera Îran û Tirkiyê de li ser herêmên kurdî, pir caran kurdên Îranê di nav agirê ajandeyên nakok de dihêlin.

### Derfet û Gefên Tevgera Kurd

Guhertina Rojhilata Navîn hem derfet û hem jî gefan li Kurdên Îranê dike. Dema ku bêîstiqrara herêmî û kêmbûna bandora Îranê ji bo statoyek kurdî vebûn çêdike, nakokiyên navxweyî yên di nav aliyên siyasî yên kurdî de astengiyek girîng çêdikin. Nekarîna partiyên Kurdistanî ji bo pêşkêşkirina eniyeke yekgirtî, pêbaweriya wan têk dide û hêza wan li ser qada navneteweyî lawaz dike.

### Derfet:

**1.** Derfetên Navdewletî: Civaka cîhanî rola Kurdan di têkoşîna li dijî terorîzmê û pêşvebirina aştî û sîstemek dadperwerane de zêdetir nas dike. Bizava netewiya Rojhelata Kurdistanê wek pêşveroyê nirxên gerdûnî yên demokrasî û mafên mirovan re, dikare piştgirîyeke berfirehtir bikşînin.

**2.** Guhertinên Herêmî: lawazbûna bandora herêmê ya Îranê derfetê dide tevgerên Kurd ku di warê siyasî û aborî de xwe bisepînin.



**3.** Hevgehiştina Netewî: Rewşa niha derfetek nû afirandiye ji bo ku bizava siyasiye her çar perçên Kurdistanê bi awayek kolektîf û berfirehtir dîplomasiyek netewî û realîst bikar bîne û pêgeha doza Kurd û Kurdistanê li cîhanê xurt bike.

### Rêya Tarî ya Jihevketinê

Nakokiyên navxweyî yên di navbera aliyên siyasî yên Kurd de, gefê li tevgera Kurd dixwe. Hevrikiyên ku di îdeolojî, meznahîxwazî û daxwazên kesane de ne, sedem perçe kirine, hawîrdorek ku hêzên derve bikarin van dabeşan îstismar bikin ava kirin.

Bêyî stratejiyeke yekgirtî, tevgera Kurd metirsiya wendakirina derfeteke dîrokî ya ji nû ve pênasekirina paşeroja xwe li Rojhilata Navîn dike.

Nebûna serkirdayetî û nêrînek hevgirtî rê li ber şiyana partiyên kurdî digire ku bi aktorên navneteweyî re danûstandinan bikin an jî gelê xwe bi bandor kom bikin. Her ku Komara Îslamî lawaz dibe, nebûna yekrêziyê dikare bibe sedema kêmbûna zêdetir an jî tepeserkirina tund li navçeyên Kurdistanî yên Îranê.

### Çi li Rojhelata Kurdistanê ye?

Pêşeroja Rojhelata Kurdistanê bi çarenûsa berfirehtir a Komara Îslamî û Rojhilata Navîn a ber bi pêş ve girêdayî ye. Ji bo îstifadekirina vê kêliyê, divê rêberên Kurd pêşî li yekîtiyê bigirin û nakokiyên navxweyî derbas bikin. Bi pêşkêşkirina eniyeke yekgirtî, ew dikarin baştir doza mafên xwe bikin û bi hêzên navneteweyî re tifaqên domdar ava bikin.

Lêbelê, riya pêş de bi xetereyan tije ye. Dewleta Iranê û hêzên nawend gera hemû derfetan bi kar dibin ji bo lawaz kirin û ji nav birina bizava xelkê Kurdistanê.

Bêyî stratejiyeke zelal, tevgera Kurd dibe ku xwe di rewşek metirsîdar de bibîne û nikaribe li ser dînamîkên herêmê yên diguhere sermayeyê bike.

### Encam

Hilweşîna rejîma Esad û bêîstîqrariya zêde ya di nava Îranê de ji bo Rojhelata Kurdistanê demeke girîng nîşan dide. Ev hem dema derfeteke nedîtî û hem jî xeteriyeke girîng e.

Tevgera Kurd divê dubendiyên xwe yên navxweyî çareser bike û ji bo rêgirtina li kêşeyên li pêş, nêrînek hevgirtî bipejirîne. Bi yekitî û tifaqên stratejîk re gelê Kurd xwedî şensê ku pêşeroja xweserî û xwerêveberiyê misoger bike. Bêyî wê, ew metirsiya li paş hiştina di nav qûmên diguhere yên Rojhilata Navîn de ne.

Kilîla serketinê di derbaskirina dubendiyên navxweyî de, avakirina eniyek yekgirtî, û rêveçûna stratejîk li guheztina dîmena jeopolîtîk e.

Divê tevgera kurd diyalog, lihevkirin û dîtineke zelal ji bo pêşerojê bigre ser xwe da ku dema niha ya nediyariyê gelê kurd ber bi rêyeke tarî ve neçe.

# Rojava, Derfet, berpirsyarî û berjewendî



**N. Elî Munezemî**

Gellek kes dibêjin ku derfeta bo kurdan li Rojavayê Kurdistanê hatî pêsh, fersendeke sedsalî e û weha derfetek sed salan carek bo neteweyekê dikare bê pêsh û eger partî, rêkxistin û komên kurdistanî wê fersendê bash bi kar neynin, dibe carek din Kurd li Rojava 100 salan chavnihêr be heta carek din mecalek hanekî bash jêre chêbe.

Ew yeka erkek mezin dixe ser milê hemû xelkê kurd bi gishtî û bi xasma partî û chalakvanên li Rojavayê Kurdistanê. Ew yeka li Kurdan dixwaze ku:

**1.** Dibe nêrîneke siyasî ya berfireh were pêşxistin. Em kurd ku niha li serdema xebata rizgarîxwazane a neteweyî-nîshtimanî de ne, dibe vîzyoneke me a zelal hebe. Divê partî û kesayetiyên sîyasî bi awayekî zelal nêrîneke hevpar ji bo Rojavayeke demokratîk, piralî û berfireh ku xizmeta hemû pêkhateyên etnîkî û olî, Ereb, Asûrî û Êzdî dike, bêxe rojevê.

Derheq wê yekê ewa PYD xwediyê tecribe û pratîkek bash bûye heta niha. Lê ewa ku PYD rê nedaye aliyên din yên sîyasî ku ew jî di wê pêvajoyê de pishikdar bin û ewan aliyan jî li ciyê hevkarî û nîshandana toleransê bi PYDê re, chon û tevî aliyên opozîsyona Sûryeyê yên girêdayî bi Tirkiyeyê re tîfaq kirin, kêmasiya herî mezin a wan herdu enîyan e. Dibe kurd xwe ji perçebûnê dûr bixin:

Hevkariya di navbera partiyên curbicur ên kurdî û komên din ên herêmî de bihêztir bikin, da ku li ber sedema dubendiyên navxweyî têkoşîna rizgarîxwaziyê têk neçe.
Ji ber wê yekê jî pêdivîye ku PDK û PKK bo pêshvechona proseya li hev nêzîkbûna aliyên kurdî li Rojava, bi wan re alîkar bin û nehêlin rikeberiya di navbera wan de, kurdan bêhtir perche bike.

**2**. Dibe modelek xurt û demokratîk bo rêveberiyê di Rojava de pêkbîbnin. Her wek ku hate gotin, PYD di wî alî de pêngavên mezin hilgirtine.

Lê bi pishikdariya aliyên sîyasî ên din, dikare ewê yekê hîn xurt bike û ewê modelê bike mînakek bo rêveberiya hevpar û pishikdarker di Rojhilata Navîn de.

Li hêlek din jî bide piştrastkirin ku mafên mirovan û wekheviya zayendî di pratîkê de yê birêve herin û ew yeka jî dikare pêbaweriyê hem li herêmî hem jî li qada navneteweyî ava bike.

**3.** Xurtkirina xebata dîplomatîk û rakishandina piştgiriya navneteweyî di dema niha de û bi xasma ku chavên zaf hikûmetên herêmî û zilhêzan li kurdan e, zêdetir li her demekê hem pêdivîye û hem jî mumkin e.

Partiyên Rojava dibe têkiliyên dîplomatîk bi aktorên navneteweyî re, di nav de YE, DYA, NY û rêxistinên mafên mirovan, zêdetir vegeshînin.

Partiyên sîyasî yên Rojavayê Kurdistanê û hemû xebatkarên qada dîplomasiyê li Kurdistana mezin de, dibe cehd bikin bo nîshandana rûyeke meqbûl bo doza kurd li ser esasê hevkeviya zayindî û pêshvechûna xebata civakî û prensîpên din yên demokratîk.

Ew dibe deriyên zêdetir li ser kurdan de wekin û pirsa kurdan tenê bi yek alî ve (tenê welatên rojavayî an Rûsiya bi tenê) girê nedin û cehd bikin pishtgiriya gellek aliyan bo xwe rakishînin.

**4.** Mifah li civaka sivîl û nirx û elementên nasnameyî bihête wergirtin. Dibe birêveberên Rojavaya Kurdistanê civaka sivîl wek fersend bo xwe bibînin û bi pishikdarkirina wan di pêvajoya biryarchêkirinan û birêveberiyê de, pishtgirtin û baveriya xelkê xwe bi xwe û sîstema xwe ya desthilatdariyê xurt bikin û buhayek mezin bidin nirxên hevpar yên Rojavayê Kurdistanê yên wek wekhevî, demokrasî û azadiyê.

**5.** Chêkirina sîstemeke xurt a parastinî mezintirîn erk e di dema niha de. Bo wê armancê dibe kurd li Rojava li



aliyekê sîstemekê chêbike ku nehêle bi hîch awayekê sher û pêkdadanên birakujî li Rojava chêbibin.

Li ber hindê jê chêkirina yek hêza parastina nîshtimanî pêdivî e. Li hêla din jî dibe di pratîk de piştrast bike ku hêzên leşkerî bi dîsîplîn, profesyonel û bergirîker bimînin û bidin eyankirin ku ew hêz bo parastina Rojava ye û ne ewa ku hêzeke hêrishkar be.

**6.** Nehêle sîstema nû a Sûryeyê yan jî welatên derdorê wan bêxin bin zext û guvashên sîyasî-aborî. Dibe Rojava li dîrok û rewsha Bashûrê Kurdistanê shîretê werbigre. Li ber hindê jî pêdivî e ku statejîyeke aborî bo xweseriyê hebe ku fokûs bike ser xwe jiyandin, berdewamî û avedankirinê.

Bo wê armancê jî dibe li hemû alîkariyên derve û yên navnetewî wek alîkariyên mericane mifah werbigre. Her weisa chavkanîyên xwezayî biparêze û nehêle ku bikeve destê bîhaniyan û xelk li xêra wan bêpar bimîne.

**7.** Dibe hemû aliyên siyasî pragmatîst tev bigerin û xwe li pirensîpên dogm yên îdeolojîk biparêzin û ewê bikin ku bo xelkê kurd pêdivîye. Em kurd zaf caran bûne qurbaniyên serhishkiya îdeolojîk û nabe em karek wisa bikin û îdeolojî bibe sedem dijmin bo me chê bibin û yan jî em bebin canê hev.

**8.** Avakirina sîstemek nûjen a perwerdehîyê ku esasê her civakekê ye, bo Rojava jî hevceyîyeke îroyîn e. PYD heta niha kariye xîmekê bo perwerdeyê chê bike. Lê bi sedema rewsha Rojava, ew sîstem nikare bersiva pêvîstiyên Rojava bide.

Ber hindê jî Sîstemek ku hem pêdavîstîyên wê bêne chareser kirin û hem jî pirensîpên xwe yên bingehîn wek pêshxistina azadî, demokrasî û mafên merivan berdewam bike, gellek bo chêkirina pasherojeke gesh bo xelkê me, lazim e.

Ew yeka hem erkê kurdan bi gishtî û hem jî erkê desthilatdarê Rojavayê Kurdistanê e ku bo pêshxistina sîstemeke wisa a perwerdehiyê kar bikin.

**9.** Xebata rizgarîxwazî pêvajoyeke demdirêj e. Ber hindê jî dibe Rêveberên Rojavayê Kurdistanê hem hereshe û tehlûkeyan bash bibînin û rêka chareseriyê jê re bibin û hem jî xebata xwe bi bêhneke fireh pêshve bibin.

Dijminên me pir û dostên me kêm in. Lê em eger pêdagir bin li ser pêshxistina demokrasî, hurmetdanîn bo pirrengî û nirxên ku îro li hemû cîhanê de pesend dibin û cehd bikin ku Rojava wek yekîneyek sîyasî a xwedî serverî li cîhanê de were pejirandin, chi guman namîne ku xeba xelkê me yê bigihîje armanca xwe.

Ev tedbîrên me bas jê kirin, ne tenê dikarin têkoşîna azadiyê ya Rojava de xurtir bikin, di heman demê de yê wê herêmê bikin mînaka herî bash a pratîka demokratîk û rizgariya aştiyane ya li herêmeke aloz wek Rojhilata Navîn de.

Rojava dikare bibe sedem paradîgmeke nû û bêhempa di herêma Rojhilata Navîn û di xebata rizgarîxwazane de destpê bike. Rêka azadiyê li berê kurttir bûye, lê dibe em pêngavên xwe rast bavêjin.

# Pêşhateyên heyî îro zêdetir hevkarî û tifaqan weke erkek netewî derdixe pêş me



N. Cano Amedî

Îro rûdanên li Rojhilata Nêzîk di qewimin, pêlên ba û bahozên civakî geş dike û rê li ber guhertinên mezin vedike. Em dibinin ku bandora wê bahozê, li welatên heremê roj bi roj, bi erdhêjên civakî re rûbirû dibe û derbeyên şikestinê li sîyaseta dewletên dagirker û hêzên wan yên wekîl dixe. Ev rewşa hanê derfetên nû derdixe holê û alîyên sîyasî yên bi rêxistinî jê sûdê digirin.

Hêzên hov yên tûndrew li gorî berjewendîyên xwe pêvajoya guherandinên îroyin dixwînin, şîrove dikin û jê îstîfade dikin. Lê mixabin hinek hêz û alîyên Kurdî di gerînoka qeyranên sîyasî û nakokîyên navxwoyî de “pêşbirka kor, kerr û lalbûnê” dilîzin. Li beranberî hev zimanekî dijber û berçavkên îdeolojîk bikartînin.

Ev nexweşîya hanê, her diçe diyalog û rîya têkoşînek hevbeş dixetimîne, li hemberî hewldan û xebatên ji bo doza netewî astengîyan derdixe holê û xeta netewî qels dike.

Van çil salên dawîyê, me dît ku sîyaseta bi kirasê îdeolojîk dimeşe, bi her awayî bûye bingeha problem, nakokî û dijberîya nav mala Kurdî. Pîvan û sînorên sîyaseta îdeolojîk têra xwe teng, dijber û ji naveroka hûqûqa gelemperî dûr e.

Em baş dizanin ku desthilatdarîyên ji hiqûq û pîvanên demokratîkbûnê dûr dikevin, xwe dispêrin pergalên dîktatorîyê. Ev jî yek ji wan encamên nexweşîya jehrîbûna ji hêzê ye.

Lewra paradigmaya sîyaseta îdeolojîk li ser yek dengî, yek rengî û bîatkirinê ye, ji ber wê yekê, bi xwe re jî bi der û dora xwe re jî nelihevkirî ye. Ev sîyaseta hanê bi motîf û rengên xwe, an jî bi naverok û cudahîyên xwe tu ferqeke cuda dernaxe holê, encam yek e. Rêxistinên îdeolojîk, tûndrew yên dînî û yên çep desthilatdarîya xwe li ser bingeha bîatkirinê û serîtewandinê didomînin.

Ji bilî xwe mafê desthilatdarîyê bi tu alîyan re parve nakin. Ji ber wan sedeman li wargehên îdeolojîk yek rengî, yek dengî û demsalên bîatkirinê bi bandore.

Ev ji sed salî zêdetire ku li Rojhilata Nêzîk, ew dewlet û rejimên bi hevîrê îdeolojîya Baas û Kemalîzmê, bi hişmendîya fetîh û talankarîya şîa û xîlafetê tevdigerin çanda dîktaorîyê li seranserê Kurdistanê bi cîh kirine.

Civat dîl girtine û bi darê zorê desthilatdarîya xwe domandine. Berhemên wan îdeolojîyan û wersîyonên wan rê li ber trawmayên civakî û trajedîyên mezin vekirîye.

Dijberên dîktatoran gava bûne desthilatdar, rehmet li dîktatorên xwe xwendine. Îro ev rûdan û bûyerên ku em dibînin, dijîn û li dij tevdigerin, rê li ber dubare kirina kiryarên duhî vedike.

Em dibînin ku li heremê dewletên dagirker, rejimên desthilatdar, di gêrînoka emperyal û dîktatorîyê de bi rêya sîyaseta tunehesibandin û tunekirinê li hemberî milletê Kurd tevdigerin û dimeşînin.

Sîyaseta ku îro di nav kurdan de desthilatdar e, ji ber ku îradeya xwe radestî kesayetekî ku dîl e kirîye, di eslê xwe de dest û linge xwe jî qeyd kirî ye, ne azad e, ne xwedî biryar e.

Bi şêweyekî xwebexş, xwe radestî pêvajoya dîlbûnê kirine. Bi bazindeyên ji hev cuda, civata Kurd jî dîl girtine, weke xelekên hevdû dorpêçkirî, tesîreke xirab, bandoreke negatîf û demsalên bêhêvîtîyê geş dikin.



Ji ber van sedeman, em bawer in ku li seranserê Kurdistanê sîyaseta netewî/niştîmanî dikare rê li ber pergalên dîktatorîyê asê bike û derîyê pêşketin û guhertinên civakî veke, rê li ber destkeftîyên nû geş bike.

Ev jî bi mobîlîzekirina hişmendîya netewî û sînerjîya milî mumkun e. Ji bo wê, divê li hemû beşên Kurdistanê, alîyên sîyasî dikarin bi hişmendîya milî destkeftîyên nû, statuyên nû û serkeftinên kurdî bidest bixin.

**Rûdan û guhertinên ku îro li Rojhelata Nêzîk diqewimin ne tesadufî ne. Çirandina nexşeyên kevin rê li ber nexşeyên nû vedike. Girîngîya jeopolîtîkbûna Kurdistanê, rol û erkê taybet derdixe holê, divê alîyên kurdî vê rastîyê bibînin û bi bernameyek milî, bi têkoşînek hevbeş, di zûtirîn wext de dezgeh û sazîyên temsîlkarîya doza kurdî derxînin pêş.**

Tifaq û hevkarîyên di navbera alîyên kurdî de gava bi hişmendîyeke milî û aqlê kurdî bê serastkirin, em bawer in wê milletê Kurd, di encama pêvajoya îroyin de destkeftîyên zêrîn bi dest bixin. Statu û hebûna Başûrê Kurdistanê, rol û erkê lokomotîfbûnê dide ser milên rêvebirîya wê.

Ji bo kordînasyona nav perçeyan beşan pêwîstîya me bi diyalog, hemahengî û aqlê Kurdî heye. Divê hemû alîyên kurdî dev ji nîyetxwendina hev û dijberîya hev pûçkirinê berdin.

Bi pêşbînîyek kûr û dirêj, em dikarin ji van firsendên derketine holê sûdê bigirin. Xurtkirina rêya serkeftinê, girêdayi hewldan û têkoşînek hevbeş e.

Em hêvî dikin hemû alîyên sîyasî, ji bo temsîlkirina miletê Kurd bi hevre tevbigerin, têbikoşin û xebatên hevbeş derxin pêş.

Rojev zû diguhere, divê em bi lezgînî û bi hev ra rojekî zûtirîn li îstasyonê amade bin ku em bikaribin li tirêna azadî û serxwebûnê suwar bin.

Eger em bi lez tevnegerin û tifaqa xwe saz nekin, li istasyonên paşmayî, emê cardin li benda hêvî û biharek din, li benda trênek din bimînin.

Li ser bingeha statuyek milî ku ji mafên miletbûnê pêk tê, bi xebatên hevbeş, bi têkoşînek domdar, bi tifaq û hevkarîyên netewî divê hemû alîyên kurdistanî erkên xwe yên dîrokî bi cîh bînin.

## Nerîna




**"Mazlûm Ebdî":**

**" Me tekezî li ser wê yekê kir ku divê helwesta kurdan li Sûriyê yekgirtî be û diyaloga ligel Şamê bi aştiyane be û mafên gelê kurd bê parastin"**



**"Osman Baydemir":**

**" Pîroz be. Ev daxwaza bi milyonan kurdan bû. Hezar car mala te wisa ye. Em hêvî dikin ku ev yek berdewam bike û rê li ber başiyê veke"**



**"Vladimîr Pûtîn":**

**"Em ê piştgiriya gelê Sûriyê bidomînin"**



**"Dewlet Bakcelli" :**

**"Çarenûsa Kurd û Tirkan yek e û kes nikare nakokiyan di navbera wan de çêbike."**

# Trump vegeriya û Îran hêj bombeya Etomî dixwaze!



**N. Eskender Ceiferî**



Tevî ku dîsa Donald Trump vedigere ser desthilata Amêrîkayê û gefên xwe li ser Îranê zêde dike, lê rêjîma Îranê di destwerdanên xwe de li navçeyê berdewam e.

Piştî ku rêjîma Îranê hajekên xwe yên balêstîk dane Hûsiyan û wan jî bi wan hajekan êrîşî ser cihên sivîlan li Îsraîlê kir, dîsa derket holê ku rêjîma Îranê dixwaze bombeya Etomê çê bike.

Ev xuya dike, heke rêjîma Îranê bi hajekên balêstîk êrîşî ser Îsraîlê dike, dibe ku ev rêjîm ji bo çêkirina bombeya Etom jî her tiştî bike da ku aloziyên zêdetir li navçeyê çê bike.

Ev jî di demekê de ye ku rêjîma Beşar Esed, mezintirîn dîktatorê ku ji aliyê rêjîma Îranê ve dihat piştevanîkirin, hate rûxandin û Îran zêdetirî berê nîgeran e.

Heman hajekên ku niha Hûsî davêjin Îsraîlê, di destepêka şoreşa Jînayê de rêjîma Tehranê bi wan hajekan, êrîşî ser baregehên partiyên Kurd dikir û di encamê de bi dehan sivîlan şehîd bibûn.

Ev jî di demekê de bû ku rêjîma Îranê careke din îdia dikir ku ew bombeyê naxwazin û wê piştî heyameke din, careke din Danûstandinên Etomî dest pê bikin.

Di dema desthilatdariya Îbrahîm Reyîsî de, Husên Emîrebdulahiyan wezîrê derve yê rêjîma Tehranê ragihand ku êdî rêkeftina Etomî ji aliyê wan ve nakeve ber bas. Ev jî di demekê de bû ku welatên Brîtanya, Feranse û Almanyayê ragihandibûn ku ji bo nîşandana niyazpakiya xwe, reşnivîsa li dijî Îranê nadin Ajansa Navdewletî ya Etomê.

Lê niha piştî êrîşa Hûsiyan ji bo ser Îsraîlê bi hajekên Îranê, derdikeve holê ku rêjîm dixwaze fitneyê li deverê berfireh bike.

Beriya niha piştî êrîşa ser Kela Dêmokrat û partiyên din jî dîsa metirsiyên vê rêjîmê xuya bibûn.

Wê demê hejmarek ji parlamenterên Almanî ragihandibûn ku "me li vir li parlamentoya Almanya gotûbêj û nirxandina mijaran dikir û hevdem jî rêjîma Îranê bi dronan êrîşî ser cihên sivîlan li herêma autonomî ya Kurdistana Îraqê kir. Pêwîstiya Ewropayê bi stratêjiyeke nû li hemberî Îranê heye. Ev gelek sal in ku li Îranê binpêkariyên berfireh ên mafên mirovan çê dibin û lewma em nabe li ser mijara rêkeftina Etomî biaxivin."

Piştî ku rêjîmê got ew dîsa rêkeftinê dixwazin, Donald Trump serokkomarê berê yê Dewletên Yekbûyî yên Amêrîkayê dewsa xwe da Joe Biden û dihat pêşbînîkirin ku dewleta Biden vegere ser gotûbêjan ji bo rêkeftina Etomî bi Îranê re.

**Dewleta Biden nekarî Îranê razî bike ku nabe bibe xwediya bombeya Etomî. Niha jî dîsa Donald Trump vegeriya ye ser desthilatê û lewma rêjîma Îranê zêdetir ditirse. Ev rêjîm dixwaze zûtir bombeya xwe çê bike da ku metirsiyên xwe ji bo ser navçe û cîhanê zêdetir bike.Îsraîl jî bi Amerîkayê re hevnerîn e û dibêje nabe Îran bibe xwediya bombeyê.**

Rêjîma Îranê jî bersiva berpirsên Îsraîlî û Amerîkî dabû û gotibû: "Wê cîhan wan gunehbariyên ku rayedarên Îsraîlê dikin, ji bîr neke." Piştî ku Donald Trump rêkeftina Etomî ya bi Îranê re bi tundî rexne kir, Rex Tillerson wezîrê Derve yê Amêrîkayê jî xwest rêkeftina Etomî ya bi Îranê re were guherandin û jinûve were nivîsandin lê ji bo razîkirina Îranê ew li benda piştgirîya hevalbendên xwe yên Ewrupî ne.

Tillerson got ku xalên rêkeftinê têra xwe tund nîn in û rê li ber planên Etomî yên rêjîma Îranê nagirin. Wê demê Sergey Lavrov Wezîrê Derve yê Rûsyayê ku ji bo Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li New Yorka Amêrîkayê bû, li ser helwêsta Amêrîkayê ya di mijara Îranê de dabû xuyakirin ku helwêsta nelihevkirinê ya Donald Trump serokkomarê Amêrîkayê cihê fikarê ye.

Feranse, Brîtanya û Almanya difikirin ku heke Îrana Etomî bikeve Rojhilata Navîn, ewê pêgeha xwe ji dest bidin. Lewma jî reşnivîsa li dijî Îranê nedan Ajansa Navdewletî ya Etomê ji bo ku niyazpakiya xwe nîşan bidin û Îranê vegerînin ser maseyê. Lê bi êrîşa balêstîkî ya Hûsiyan bo ser Îsraîlê ku ji aliyê Îranê ve tên piştevanîkirin, derket holê ku êdî Îran rêkeftinê naxwaze.

Amêrîka hertim bi raportên çalakiyên Etomî yên Îranê re bi baldarî riftarê dike û gotara wezareta Derve ya Amêrîkayê hemû wan pirsyaran bersiv nade ku çima Amêrîka di wajokirina raportan de dudil e û sedem çi ne lê bi gotarên berpirsên rêjîma Îranê zelal dibe ku dorpêçên nû yên aborî, nabin rêgir ji bo ku Îran dev ji bombeyê berde. Berpirsên Îranî dibêjin tê çawerêkirin ku Amêrîka givaşan zêde bike lewma jî Îranê dixwaze li ser karên xwe berdewam be.

Rêkeftina Etomî di roja 14ê Tîrmeha 2015'an de bi tevlîbûna welatên Ewropî hatibû wajokirin û li gor wê, Îranê hin çalakiyên Etomî kêm dikirin û di hember de jî dorpêçên aborî li ser Îranê dihatin kêmkirin.

Donald Trump di gerra yekem ya serokkomariya xwe de ew rêkeftin têk bir. Niha li bendê ye piştî ku ew dîsa vedigere, dê çê bike?!

# Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat daxuyaniyek belav kir

Piştî derbasbûna salekê li daxwaza pêdeçon bi sizaya sepandî bo her yek ji girtiyên siyasî yên Kurd, Pexşan Ezîzî û Wirîşe Muradî, mixabin parêzerê “Pexşan Ezîzî” ragihand ku sizaya bidarvekirina navbirî ji aliyê dîwana bilind a dadweriya rêjîmê ve hatiye erêkirin.
“Pexşan Ezîzî” sala par li bajarê Têhranê de hate binçavkirin û heta niha li girtîgeha Êvînê de rastî gelek azar û îşkenceyan hatiye, pêka gotina vê bi xwe û parêzerê vê, endamên malbata vê û gelek ji kesên nêzî vê, bilî gihandina çalakiyên mirovî li warê tendirustî û gihandina hevkarî bi xelkê, ji wan hemû tometên lêdayî, dûr bûye.
Belavbûna nûçeya erêkirina sizaya bidarvekirina Pexşan Ezîzî, xelkê Kurdistanê û rêkxistinên parêzvanê mafên mirovî û çalakvanên siyasî û medenî nigeran kirine û li vê derheqê de hewlên cur bi cur digel rêkxistina kempêyna nerizayetî li dijî vê sizaya sepandî û bo ragirtiona vê, têne dan.

Pêla destbiserkirina çalakvanên siyasî û medenî û herwisa sepandina sizaya nedadperwerane yên cur bi cur bi ser girtiyên siyasî li Kurdistan û dever û cihên din ên Îranê, ji aliyek nîşanderê lawazî û şikesta rêjîmê li hember qeyranên navxweyî û deverî ye ku tûş bûye, û ji aliyê din ve jî tirsa ji teqîna kerb û bêzariya pengurî ya gelên Îranê ku dehan sale têne tepeserkirin.
Rêjîma komara Îslamî wa hizir dike ku bi girtina çalakvanên siyasî û medenî û sepandina sizayên giran û narewa bi ser wan de, dê bikare rewşa tirs û xofê bi ser xelkê û welat de bisepîne û bi xeyala xwe rêgiriyê ji tevgera nerizayetiyan bike.

Ew li halekê de ye ku bilî berefirehtirkirina pêla nerizayetiya gelên Îranê li dijî rêjîmê, rêjîm bi xwe bi sedema guherînên deverê û pirsgirêkên bingehîn ên navxweyî, li rewşeke tevav xirab û bi kirîz de ye û bazna alîgirên vê roj bi rojê bertengtir bûye û jêwerîn zêdetir dibe.

Hizba Dêmokrat a Kurdiatana Îranê tevî şermezxarkirina sepandina sizaya bidarvekirinê bi ser Pexşan Ezîzî, Wirîşe Muradî û tevahiya wan girtiyên siyasî ku bi nerewa, sizayên curbicur bi ser wan de hatiye sepandin, piştevanî li her hewlekê bo hilveşandina vê sizaya nedadperwerane bi erkê azadîxwazan bi taybet kom û cîvaka berevanîker ji mafên mirov û welatên dêmokratîk dizane.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Navendea Birêvebnerî**

**11ê Kanûna Duyem a 2025**

# Gotûbêja li ser danasîna çar kitêbên dawî ji berhem û nivîsa Seîd Veroj

## 3. DR. ŞUKRÎ MEHMED SEKBAN (1960-1881)



**N. Seîd Veroj**

Di sala 1881ê de li Paxirmadena Erxenîyê ji dayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî û navendî li Erxenî û Dîyarbekirê temam kirîyî, paşî ji bo xwendina îdadî û Tibîyeya Eskerî çûye Îstenbolê.

Beşekî xwendina xwe jî di kolêja Saint Josephê de berdewam kirîye û li wê derê di derceyeke baş de hînê Fransizî bûye.

Wî di sala 1903an de bi rûtbeya yuzbaşîtî Mekteba Tibîye ya Eskerî xelas kirîye û dest bi doktorîyê kirîye.

Dr. Şukrî Mihemed Sekban, yek ji wan rewşenbîr û sîyasetmedarên navdar ên kurd e ku di nav gelek rêxistên kurdê ên dema Osmanî û paşî jî yê Cimhurîyetê de cî girtîye.

Ji îlankirina Meşrûtîyeta Duyemîn şûn ve, bi awayekî legal xebata çêbûna cemîyetên kurd dest pêkirîye û cemîyeta yekemîn a ku li ser navê kurdan hatîye avakirin jî Cemîyeta Tewaûn û Teraqîya Kurd e.

Ew, yek ji wan kesa ye ku bi awayekî aktîf di nav xebata Cemîyeta Teawûn û Teraqîya Kurdan de cî girtîye û di dema hilbijartina rêvebirîyê de kesê duyemîn e ku rayên herî zêde bidest xistîye.

Piştî ku xebata cemîyeta navborî ji alîyê îdareya wê demê ve tête rawestandin, di sala 1912an de bi navê Cemîyeta Hêvî ya Talebeyên Kurd rêxistineke tête damezrandin.

Wî di nav kar û xebatên damezrandina vê cemîyetê de jî cî girtîye û li gor şertên wê demê gelek caran piştgirîya aborî daye cemîyetê.

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, dema ku Cemîyeta Tealîya Kurdistanê tête damezrandin, ew dibe yek ji endamên çalak yê rêxistina nû û ji parçebûna CTKê şûn ve di nav koma serxwebûnxwazan de cî digre û dibe endamê Cemîyeta Teşkîlatê Îçtimaîye ya Kurd ku bi serokatîya M. Emîn Bedirxan hatibî damezrandin.

Wekî gelek rewşenbîrên Kurd, ew jî di dawîya sala 1922an de ji bêgavîyê terka Îstenbolê dike û berê xwe dide Libnanê û ji wir ve jî derbasê Bexdadê dibe. Dema ku ew li Beyruda Libnanê bû, bi îmzeya “Amraz-ı Cildiye ve Efrenciye Mütahassısı Doktor Şükrü Mehmed”, di roja 14ê Eylûla 1922an de nameyekê aşkera bi sernivîsa “Kurd ji Tirkan Çi Dixwazin”, ji Mistefa Kemal re dişîne.

Piştî çend mehên din derbasê Bexdadê dibe, xebatên xwe yê rêxistinî û siyasî li wê derê berdewam dikin. Di salên 1925-1926an de dema ku kovara Dîyarî Kurdistan tête çapkirin, di vê kovarê de bi sernivîsa “Di alema nû ya Îslamê de ceryanên millî”, rêzenivîsekê wê tête çapkirin ku pêk hatîye ji deh beşan.

Ew li wê derê bûye endamê Cemîyeta Tibîye ya Bexdadê û du dewre jî rêvebirîya wê kirîye û herweha di dema Serokwezîr Nûrî Seîd de bûye Midurê giştî yê Tenduristîya Iraqê ku di dereca wezîrîya îro de bû.

Di sala 1927an de dema ku kongreya neteweyî ya bi navê Xoybûnê hate sazkirin, wî rêvebirîya kongreyê kir û herweha yek ji serkirdeyên vê rêxistê bû û wezîfeya nûnertîya Bexdadê girte ser milê xwe.

Bi kurtayî em dikarin bibêjin ku Dr. Şukrî Mihemed Sekban, sala 1908ê ji damezrandina Cemîyeta Teawûn û Teraqîya Kurd bigre heta dawîya sala 1933yê ku kitêba wî ya bi navê “La Question Kurde” li Parîsê tête çapkirin, kêm zêde di desteya bilind a hemû rêxistinên Kurdan de cî girtîye.

Bi navê rêxistinên navborî, digel hevalên xwe tevlî gelek hevdîtinan bûye ku bi dewlet û mîsyonên bîyanî re hatine çêkirin.

Bi kurtayî Dr. Şukrî Mihemed Sekban, rewşenbîr û sîyasetmedarekî kurdê navdarê sedsala 20an bû, bi zimanê kurdî, erebî û fransizî baş zanîbû.

Piştî çapbûna kitêba wî ya bi navê “La Question Kurde”, ji alîyê hevalên wî ve gelek rexne li wî tête kirin.


Refîq Hîlmî ji kitêba wî ya navborî re “red û tenkîdek” dinivsîne.

Piştî efûya sala 1938an, ew jî vedigere Tirkîyê û li îstenbolê bi cî dibe, dest bi doktorîyê dike û heta dawîya jîyana xwe li wê derê dimîne.


Wî di roja 08.05.1960an de li Îstenbulê koça dawî kirîye.

Nevîyê wî yê Prof. Faruq Bîrtek dibêje: Dr. Şukrî Mihemd Beg, hîç demekî ji kurdîtîya xwe tawîz nedaye, ew kurd çêbû û kurd mir.”

Ev kitêba ber destê we jî, behsa çîroka jîyan û serûwena Dr. Şukrî Mihemed Sekban dike.



# Rojavayê Kurdistanê û astengiyên niha



N. Ebdûlazîz Qasim

"Rêjîma Sûriyê" piştî çend salên dijwar û qurbaniyên mezin û têkoşîneke dûr û dirêj ya xelkê sûrî hate rûxandin, wekî erdhejekî ku encamên wê hêjî berdewam in û arasteyek diyar û zelal bo siberoja Sûriyê nîne!
Ji ber valehiya peydabûyî ji egerê rûxandina rêjîmê û pêwîstiya xelkê bi rêvebirina karûbarên dezgehên dewletê û çareserkirina pirsgirêkên siyasî, leşkerî, aborî civakî ... hd li ser qadên Sûriyê û bi taybetî li ser qada Rojavayê Kurdistanê, ku hêjî Rojavayê Kurdistanê ji aliyê komên çete yên girêdayî Tirkiyê bi awayekî rojane tê topbarankirin, gef ji aliyê berpirsên bilind yên Tirkiyê li Gelê Kurd têne xwarin, hevdem digel vê yekê ku îro bizaveke cemawerî ji aliyên kesayetiyên serbixwe peyda bûye bang bo yekrêzî û yekdengiya aliyên siyasî yên kurdî destpê kiriye, pêdigiriya cemawerî li ser karnameyeke neteweyî û pêkanîna nûnersyetiyeke siyasî hevbeş roj bi roj zêdetir dibe, hevdem digel liv û tevgera navneteweyî yên hinek welatan li ser dosyayên Sûriyê bi giştî û doza Kurdî bi taybetî, nemaze hewlên Amerîkayê û Fransayê yên ji bo yekrêziya kurdî dibin, ku piştgiriya van herdû welatan bi awayekî zelal bi pirsa Kurdî li "Kurdistana Sûriyê" piştrast dibe, ku careke dîtir pêwîstiya kurdan bi diyalogek kurdî-kurdî heye ku di van salên dawî de têkçûbû ji ber ku herdû aliyên kurdî (ENKS û PYD) negihştin têgihîştineke hevbeş û pirsgirêk û nakokî nehatin çareserkirin.

Îro digel zêdebûna daxwaz û gaziyên xelkê Rojavayê Kurdistanê û tevaya Gelê Kurd bo pêkanîna tifaq û yekrêziyê û mifagirtin ji hewlên navdewletî bi taybetî ji destpêşxeriya (Amerîka-Fransî), lê mixabin heta niha ti asoyek bo nêzîkbûna Kurdî-Kurdî re nabînin tevî giringiya wê ya mezin bo pêkanîna şandeke kurdî yê hevbeş û dariştina bernameyeke neteweyî ji bo danûstandin digel "Şamê" û aliyên navdewletî bibe bo bidestxistina mafên gelê kurd yên neteweyî li ser xaka xwe ya dîrokî, ku îro bi piranî û bi awayekî cemawerî hikûmeteke nenavendî federal ji bo tevaya Sûriyê tê pêşniyarkirin?.


Berovajî tiştên ku îro diqewimin û tevî hemû bang û daxwazên ji bo yekgirtin û yekrêziya kurdan, car car em dengên nexwaz ji aliyên hindek serkirdeyên bibandor yên Partiyan dibhîzin, ku bi awayekî wisa dixuye ku hewl dibin bo zêdekirina nakokî û cudahiyan û aloztirkirina rewşa heyî û berfirehtirkirina aloziyan bo derveyî sînorê Rojavayê Kurdistanê!

Ku heta niha wisa dixuye; ku hewildanên yekrêziyê rastî astengî û zehmetiyên mezin tên, zêdebarî êrîşên rojane yên Tirkiyê û çeteyên wê li dijî hebûna Gelê Kurd!.

Di rewşeke wiha dijwar de divê em wekî Kurd li bijardeyên dîtir bigerin, ku ne aqilmendiye em giringiyê bidin pirsgirêkên hizbî li ser hesabê berjewendiyên neteweyî, û giringiyê bidin pirsgirêkên partiyan û mijara serekî û çareserkirina doza piştguh bêxin, di demê ku tê xwestin nakokiyên kesane û partiyan di vê qonaxê de nemînin yan werin paşxistin!

Lê mixabin xuya dibe ku aliyên siyasî yên kurdî bê cudahî bi xemsarî têkilidariyê bi xwestên gel re dikin û hewl didin berjewendiyên xwe yên berteng û destkeftên hizbî bêxin li pêş berjewendiyên neteweyî û li pêş çareserkirina pirsgirêkên doza Kurdî, ku ev doz pêdivî bi xebatek giran û bê rawestan heye, di demê ku gerew li ser partiyan kêm dibe, lewra divê Kurd li rê û bijardeyên dîtir bigerin û her çend ku ne mumkune aliyên Kurdî bigehin rêkeftinekî, lê heger hat û têgihîştinek di nav van partiyan de peyda bibe jî, dê li ser dabeşkirina postan û destkeftiyên partayetî yên teng çêbibe, yan jî di demek kurt de, wekî rêkeftinên berê dê zû ji holê rabê û helweşe.

Tişta herî seyr û ecêb di van hemûyan de ew e ku em îro li ser medya û medyaya civakî dibînin, ku hinek serkirdeyên partiyên Kurdî ber bi aloztirkirina nakokiyan diçin û car daxwazên aliyên herêmî yên neyarên danin li




ser maseya Kurdî, yan jî hewla valakirina pirsa Kurdî ji naveroka wê ya neteweyî didin bi redkirina mafên neteweyî yên Gelê Kurd û redkirina federalîzmê yan otonomiyê li ser bingeheke neteweyî.

Di nav van alozî û nakokiyan de, tê dîtin ku aliyên siyasî yên kurdî bê berpirsiyarî û bi xemsarî têkildariyê dikin û berdewamiyê didin gotara xwe ya kevn û bêwate û bêhode; ku hestek li rex welatiyê Kurd çêdibe ku ev partî bi hejmara xwe ya mezin di xewn û xiyalan de dijîn û bûne bargiraniyek li ser doza Kurdî.
Îro dem hatiye ku perde li ser siyasetên hizbî û îdeolojî were rakirin! Ew bihane û hincetên demkî ketine û divê partiyên Rojavayê Kurdistanê li gor mercên niha bixebtin û bibin xudanê biryara xwe û divê pirsa neteweyî herî li pêş be, tevî ku hindek alî dibêjin ku demê pirsên nereweyî têkçûye!

Piştî evqas karesat û bûyerên giran yên ku di zêdetirî deh salan de bi serê gelê Kurd de hatin û bi taybetî ji ber nakokiyên hizbî û jidestdana çend derfetên zêrîn, bi sedema paşguhxistina deng û gazindê cemawerê kurd yê xemxwarê kurdîniya xwe û her wisa paşguhxistina hemû bangewaziyên navdewletî bo yekrêziyê, wek tê gotin ku tevgera Kurdî ( guhek xistiye bêjing û guhê dîtir xistiye serad), ji ber ku guhê xwe kerr kiriye û guh nedê banga milletê xwe; bi awayekî ku wisa diyar dibe ku ew ji ketwar û dorhêla xwe ya kurdîniyê dûr ketiye û qut bûye!

Zêdebarî ku piraniya Partiyên Kurdî bi hejmara xwr ya mezin ti rexneyê qebûl nakin û her dengekî berovajî berjewendiyên wan yên hizbî bêt, wekî dengekî nexêrxwaz dibînin tevî rewşa xirab ya Rojavayê Kurdistanê û bûyerên giran û felaketên ku hatine serê gelê me, her ji dagirkirina Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî û heta bigehê îro û êrîşên niha li ser Minnic û Kobanê û Dêrikê.
Îro gelek astengî dikevin li pêş pêkanîna şandeke kurdî ya hevbeş û hevdem û li gorî rewşa niha û ezmûnên borî û berê ku gerew li ser partiyên kurdî nabe, ku ti asoyek yan destpêşxerî û derfetek xuya nabe bo têgihiştin û nêzîkbûna Kurdî-Kurdî!

Lewra îro divê siyasetmedarên kurd yên serbixwe digel akademsyen û çalakvaniyên Kurd bixebtin û xwe amade bikin bo dîtina "bijardeyên alternatîf" da karibin partiyan neçar bikin bo bi roleke erênî rabin yan jî divê bi rastî jî partiyên kurdî hest bi wê yekê bikin ku "bijardeyên alternatîf" hene, dê dawiyê li serdestiya wan bîne, dê çarenivîsa wan wekî çarenivîsa wan peyker û pûtên ku niha li meydanên Sûriyê têne şikandin û rûxandin, wê demê Gelê Kurd dikarê nûneratiyek bihêz destnîşan bike û şandeke hevbeş û li ser bernameyeke neteweyî li ser formulên "federalîzm" yan "otonomî" ji bo Kurdistana Sûriyê bixebite û danûstandinên bihêz digel Şamê bike û destkeftên mezin bidest bîne.

# Tirs û derevên rayedarên Komara Îslamiya Îranê





N. Hesen Mukerem

Di heyama salên dervasbûyî de berpirsên payebilind yên Îran û Spaha Pasdaran bi berdewamî li ser ekranên televîzyonan derdiketin gefên jinavbirina Îsraîlê dixwarin û bi berdewamî çiya û bajarên Herêma Kurdistanê bi dron û mûşekên dûrhavêj bi hinceta hebûna partiyên kurd yên dijî rêjîma Îranê dikirin armanc û bi berdewamî di karûbarên birêveberiya Îraqê de tedaxol dikirin.

Lêbelê piştî êrîşa 7 Octebera 2023an a Hemasê bo ser festîvalekê li Îsraîlê kuştina sedan welatiyên Îsraîlê û hejmarek zêde geştyarên biyanî û bi ixsîrkirina 250 beşdarên festîvalê, Artêşta Îsraîlê jî biryar da ku bi hemû hêza xwe Hemas û Hizbulaha Lubnanê jinav bibe heta karî Îsmaîl Heniye serokê deftera siyasiya Hemasê li Tehranê di nav cergê Spaha Pasdaran de bikuje.

Vê yekê evqas Xaminey rêberê rejîma Îslamiya Îranê û berpirsên Spaha Pasdaran tirsandin ku di nimêja li ser termê Îsmaîl Heniye de bi zelalî diyar bû ku Xaminey çiqas tirsiya ye.

Lê gef û gurên Husêyn Selamî Berpirsê Giştî yê Spaha Pasdaran û yên din berdewam bûn û her di vê navberê de Îsraîlê êrîşî Lubnanê kir û di êvarekê de Hesen Nesrula serokê Giştî yê Hizbulahê digel 20 endamên sereke yên Hizbulahê û cihgirê operasyûnên Spaha Pasdaran jî hatin kuştin di bersiva van êrîşan de rejîma Îranê du caran bi dron û mûşekan êrîşî ser Îsraîlê kiriye lê tenê kedkarek Filistînî hat kuştin.

Piştî hilweşîna desthilata 50 salî ya Beşar Esed û bavê wî Hafiz Esed li Suriyê, Bêhrûz Êsibatî, yek ji fermandarên payebilind ên Spaha Pasdaran a terorîst a Îranê li Sûriyê, îtraf kir ku Rûsan rê dane Îsraîlê ku di demên krîtîk de bi qutkirina pergalên radarê yên wan bi hêsanî fermandarên Îranî bike armanc.

Di hin operasyonên Îsraîlê de li Sûriyê, Cîgirê Spaha Quds Mihemed Riza Zahidî, Berpirsê Piştgiriya Hêza Quds li Sûriyê Seyîd Riza Mûsewî û Cîgirê Îtla`ata Spaha Quds û Sadiq Omîdzade bên kuştin.

**Hêjayê gotinê ye ku hilweşîna desthilata Esed li Sûriyê rayedarên Komara Îslamî gelek tirsand. Ew dizanin ku berevajî Esed, dijminê wan yê sereke xelkên hundirê Îranê ye, ne hêzeke çekdar a biyanî.**

Niha ev di rahênanên taybet de ne ji bo amade bûna li dijî serhildaneke din ku dibe gef li ser mayîna rejîmê bike mejûlin, Spaha Pasdaran bi berdewamî hêzên serkutker yên xwe rahênan didin.

Rayedarên rejîma Îranê pir bi zelalî dizanin ku niha dor dora jinavçûna wan e niha piştî derbasbûna 40 û çend salan bi ser desthilata dîktator û hov a Komara Îslamiya Îranê û eşkerebûna gendelî û hovîtiyên rayedaran terorîstperwer bo xelkê û şikestxwarina van li hember êrîşên Îsraîlê çi li naxwey welat û çi li dervey welat, tirisek bêsînor xistiye dilê Xanmey û berpirsên din yên Komara Îslamî û Spaha Pasdaran û tenê gefên vala li Îsraîlê dixwen heta berê ku gefên jinavbirina Îsraîlê dixwarin lê niha ji ber tirsa xwe tenê navê tolhildana Sadiq 3 dixwen ku ev jî her gotinek vala ye.

Nîşanên jinavçûna rejîma Îranê her roj zêde dibin di heyama çend rojên derbasbûy de jî, Marco Rubio Wezîrê pêşniyarî bo psta wezareta Derve ya Amerîkayê ku di nû de hatiye destnîşankirin got ku:
Guhertinên mezin wê li Rojhilata Navîn çêbibin.

Wî hişyarî da hemû welatan ku bilez mal û milkên xwe ji Îranê derbixin, tiştekî baş ji bo Komara Îslamî ya Îranê û rejîmê nayê hêvîkirin û êdî nikare hebe jî.

Bi hatina serkar a Dunald Trump Serkomarê nû yê Amerîkayê tirs û xofa Xaminey çend hember bûye, Donald Trump di heyama 100 rojên destpa serkomariya xwe de dixwaze milê aborî ve di heyamek pir kurt de bi qasî bi dorpêçan bo Komara Îslamî bixe tengasiyê ku bixwe bikeve qedeman û hêza hey jî ji dest bide.

Di dawiyê de hewce ye behs bê kirin ku Îsraîl di dawîn êrîşa esmanî ya bo ser binkên leşkerî yên Îranê pergalên berevaniya esmanî ya binkên navikî ku bi teknolojiya S300 a Rûsiya dihatin parastin bi tevahî jinav biribûn.

Rojnama Washinton Post jî di rapora xwe a roja Yekşemî 23ê Befranbarê de weşand û hema bi zelalî îşare bi lawaziya Spaha Pasdaran bo berevanî ji binkên navkî kiriye û nivîsîbû, Îranê bi dixwast bi belavkirina raporên derev li derheq têkçûna hêza berevaniya esmanî ya xwe amûrên bihêz nîşandan, lê ev amûr kalîteya wan pir kêmtir in yên ku di êrîşa Îsraîlê de hatine rûxandin herçend rayedarên rejîmê hewl didin xwe bihêz û bêqisor nîşan bidin, lê di kiryar de wisa nine û hemû axavtin manovrên vala ne.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Ji destpêka heyva Befranbarê ve zêdetir ji 100 kesî ji aliyê rêjîmê ve hatine bidarvekirin

Rêjîma Îranê ji destpêka heyva Befranbarê ve heta 23ê vê heyvê, zêdetir ji 100 kesî li girtîgehên xwe de bidarvekirin e û li dawî raporan de jî îşare bi bidarvekirina 3 kesên din li girtîgeha Îsfehanê de hatiye kirin.

Pêka rapora Navenda Mafê mirov li Îranê, vê rêjîmê ji destpêka heyva Befranbarê ve heta 23ê vê heyvê, zêdetir ji 100 kesî li girtîgehên xwe li seranserê Îranê de bidarvekirin e û pêka dawî raporan 3 kesên din li 23ê Befranbarê de li girtîgeha Îsfehanê hatiye bidarvekirin.

Rêjîma Îranê serhev, ji destpêka heyva Befranbarê ve heta 23ê vê heyvê, rojane nêzî 5 kesan bidarvekirin e û bi awayek din, her 6 demjimêran, girtiyek hatiye bidarvekirin.

Rêjîma Îranê ji aliyekê binçavkirina çalakvanên medenî, jîngehparêzî, sendîkayî û siyasî berfirehtir kiriye û ji aliyê din ve jî rêje û lezgîniya bidarvekirin û sepandina sizaya bidarvekirinê li Îranê de zêdetier kiriye.

Rêjîma Îranê sepandin û birêvebirina sizaya bidarvekirinê, wek alavek bo tepeseriya zêdetir a xelkê Îranê bi kar tîne.



## Tepeserî û binçavkirina çalakvanên medenî li Ehwazê berdewam e

Li berdewamiya tepeseriya çalakvanên medenî li bajarê Ehwazê, zêdetir ji 15 kes ji xelkê bajarê Ehwazê bi awayekî xoserane û bê belgeya yasayî ji aliyê îtilaata rêjîmê hatine binçavkirin.

Pêka raporên belavbûyî, roja Çarşemî 19ê Befranbara 1403 a Rojî, hêzûn îtilaata rêjîmê bi awayê xoserane û bê belgeya yasayî, çendîn kes ji kesayetî û çalakên netewa Ereb li "Melaşiye û Şîlengabad"ên bajarê Ehwazê de binçav kirine.

Herwisa 3 bira yên bi navên "Xalid, Elî û Mihemed" Emûrî, li bajarê Ramşîrê de ji aliyê hêzên hov ên îtilaata rêjîmê de bê belgeya yasayî hatine binçavkirin.

Li 17ê befranbarê de jî çalakvanên medenî yên Ereb, "Seîd Îslamî Merzre`e, lêkoler û nivîskar, Mîlad Behrî, çalakvanê medenî, wênegir û nûçegihanê xelkê bajarê Şadigan, Sadiq Mensûrî, Mensûr Casimî, Ehmed Celalî, Husên Seîdî, Seîd Felahî, Ehmed Xalidî, Eyûb Terefî, Yûsif Saêdî, Mihemed Eyaşî û Elî Siwarî" ji aliyê îtilaata rêjîmê ve hatine binçavkirin û roja pêştir jî Seyîd Haşim Mûsewî(Hermûşî) li taxa Şîban a Ehwazê de hatiye binçavkirin.

Li 16ê Befranbarê de jî "Yûnis Xerbawî û Riza Zehîrî" û 3 kesên din ku nasnameyan wan nehatiye belavklirin li taxa melaşiye ya bajarê Ehwazê de hatine binçavkirin.




Pêka dawî raporan, hejmareke din ji çalakvanên Ereb li bajarê Şadiganê de hatine binçavkirin ku nasname û hejmra wan nehatiye zanîn.

## Hêzên hovên rêjîmê ciwanekî xelkê bajarê Qesrê Şîrînê kuştin

Ciwanekî temen 34 salî yê xelkê bajarê Qesrê Şîrînê, li sînorê Perwîxan ser bi bajarê Qesrê Şîrînê, ji aliyê hêzên garada taybet a rêjîma Îranê ve hate kuştin.

Pêka rapora "Hengaw"ê hêzên garda taybet a hêza întizamî ya rêjîma Îranê bi zêdenavê "NOPO", li bazara sînorî ya Perwîzxan, ser bi bajarê Qesrê Şîrînê bi awayê rasterast û bi çeka kilaşînkofê, teqe li ciwanekî temen 34 salî yê xelkê bajarê Qesrê Şîrîn ê bi navê "Mihemed Ezîzî" kirine û bi 3 gulleyan ew welatiyê Kurd kuştine.

Pêka rapora Hengawê, ew ciwanê kurd li roja pêştir de digel hêzên hov ên îtizamiya rêjîmê tûşî şer û levdanê bibû û hêzên rêjîmê li demjimêrên şevê de êrîşkirine ser wî welatiyê kurd û bi sedema berxwedana navbirî, bi 3 gulleyan ew welatiyê Kurd kuştine.

Herwisa li vê raporê de hatiye ku fermana binçavkirin û teqekirin bi wî welatiyê Kurd ji aliyê berpirsekî rêjîmê li bajarê Qesrê Şîrînê yê bi navê "Elî Rostemî" ve hatiye dan.



# Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (486)